


# Wêje û Rexne

hejmar: 6 sal: 2015-2016

*kovara lêkolîn, rexne û teoriya wêjeyê*

Mijdar · Kanûn · Çile · Sibat



## Wêje û Sirgûn

## WÊJE Ú REXNE

Kovara Çar Mehane ya Lêkolîn, Rexne û Teoriya Wêjeyê  
Weşana Demane-Hejmar: 6/2015-2016 (Çarmehî)  
Mijdar-Kanûn-Çile-Sibat

ISSN: 2148-2500

**XWEDÎYÊ KOVARÊ:** İnan Yoldaş

**EDÎTOR:** Davut Yeşilmen

**LIJNEYA WEŞANÊ:** Adnan Çelik, Güneş Kan, İlyas Cembelî Suvagçî, Semra  
Güçlü, Serdar Ay, Tahir Taninha, Zeki Gürür

**LIJNEYA WERGERÊ:** Şehmuz Kurt, Ömer Delikaya, Aynur Kaş

**RASTKIRIN:** Semra Güçlü

**ŞÊWIRMENDÊ HUNERÊ:** Ömer Delikaya

**KARÊN ABORÎ-TEKNİKİ:** Bawer Berşev-Tahir Taninha

**MİZANPAJ:** Şemal Medya

**TÊBINI:** Mafê çapkirina gotaran, tenê di destê lijneya weşanê de ye. Lê nivîskar  
ji naveroka nivîsên xwe berpirsiyar in. Herweha nivîsên ku ji kovarê re têne  
şandin, neyêne weşandin jî li nivîskîr nayêne vegerandin û bi şertê ku çavkanî  
bê nîşandan, jêgirtina ji kovarê serbest e.

**WÊNEYÊ BERGÊ:** Baldin Ahmad, Birayê Min (2011), Bicîkirin (Installation).  
Baldîn Ahmad di sala 1954an de li Silêmaniyê ji dayîk bûye. Niha li Holendayê,  
li bajarê Utrechtê dîjî.

**ÇAPXANE:**

A GRAFİK

Diclekent Bulvarı Nil Koleji Şeker Apt. Altı KAYAPINAR-DİYARBAKIR  
Tel: 0412 237 27 07 zulkufaltindag@gmail.com

**SERTÊN ABONETIYÊ:** Buhayê kovarê 10₺ ye. Ji bo Ewropa jî 10€ ye.  
Abonetiya ji bo salekê 30₺ û ji bo Ewrupayê 30 € ye.

Hesabê Banqeyê: IBAN: TR32 0004 6005 6888 8000 1722 45  
Hesap: 0568-0172245 Akbank/Ofis şubesi Diyarbakır-Tahir Ürper

**NAVNIŞAN:** Selahaddini Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Sit. A-5 Blok No:  
26 Bağlar-Diyarbakır

**TEL:** 0(530) 347 86 62 (ji bo naverokê), 0(553) 396 13 06 (ji bo aborî û abone-  
tiyê)

**WEB** [www.wejeurexne.com](http://www.wejeurexne.com)

**E-MAIL** [wejeurexne@gmail.com](mailto:wejeurexne@gmail.com)

facebook: wejerexne

twitter: wejeurexne

skype: wejeurexne

# NAVEROK

Ji Editör/05

**İbrahim Seydo Aydogan:** Rewşenbîrîya Rojhilatî û Bindestîyê li Kurdistanê/07

**Memê Mala Hine:** Wek Berhemeke Vekirî *Mem û Zîn û Şîroveyê* wê yên Ekstremlî/38

**Mîrza Baran:** Bertekeke Derhisî li Hember Makînebûnê di Novellaya Herman Melville a *Bartlebyê Nivîsevan* de/53

**Güneş Kan:** Rengvedanê Zayenda Cîvakî di Helbesta Helbestvanê Kurd ên Jin de/67

**Serdar Ay:** Hevpeyîn bi Ngûgî wa Thing'o re/77

**Vecdi Demir-Xelîl Semed:** Bîyanîbûn, Zayendî û Desthilatî di Berhemên Şener Ozmen de/88

**Cihan Kaynar:** Texeyula George Orwell: 1984/98

**Necat Keskin:** Mitirb û Mitirbî: Nasname û Vegotin /109

**Musa Ekici:** Formêن Vegetandeka Nebinavkirî di Kurmancî de/120

**Gunes Kan**

**Dawid Yeşilmen:** Li Ser Sirgûnî û Wêjeyê Hevpeyîn bi Hesenê Metê re/132

**Edward W. Said:** Rengvedanê li ser Sirgûnê/145

**Ş. Afrougheh-H. Safari**

**K. Azizi:** Poetîkaya Sirgûnê: Gerîna Ber bi Welatê Serpêhatîyên Ronakbîrî ve/159

**Mehmet Yonat:** Dîyaspora û di Kovara Nûdemê de Dîyaspora/165

**Omer Farûk Yekdeş:** Sirgûnek di Nav(ber)a Rabirdû û Niha de/183

**Francesco Marilungo:** Ji Mekanê Sirgûniyê ber bi Cihê Nasnameyê ve: Temsîlên Wêjeyî Yêñ Bajarê Amedê di Wêjeya Kurdî ya Nûjen de/202

**Dawid Yeşilmen:** Sirgûn û Rewşenbîrî: Xwendineke Tematîk li ser Romana Firat Cewerî, *Payîza Déreng*/225

**İlyas Cembelî Suvağcî:** Hêmanên Sirgûn û Penaberîyê di Romana 99 Morîkêñ Belavbûyî de/243

**Sonja Galler:** "... Ez Berê Nivîskarekî Elman bûm" Wêjeya Elmanî ya Sirgûnê di Serdema Sosyalîzma Nasyonal de/255

**Helîm Yusiv:** Wêjeya Kurdî li Derbyiderîyê/265

**Seyîd Çaçan:** Qedîcan û Xerîbî/268

**Pirtûkxane/276**

# HÊMANÊN SIRGÛN Û PENABERÎYÊ DI ROMANA 99 MORİKÊN BELAVBÛYÎDE

## 1. Destpêk

Sirgûn wek qadeke dorfireh tê zanîn di edebîyatê de. Di navbera sirgûn, diaspora, penaberî, koçberî, xerîbî... hwd. de têkilîyeke xurt heye û ev hemû bi dirûvên cihê yên koçkirinê re girêdayî ne. Lê dîsa jî ev pevy di heman wateyê de nînin lewma sedemên koçkirinê û encamên wê jî ne yek in. Jî ber gelek sedemên cuda mirov koç dikin yan jî ji welatê xwe dûr dikevin lewma êdî bi tenê bi peyva ‘sirgûnê’ ev guhertin nikare bê diyarkirin di rewşa îtroyîn de. Hêmanên sirgûn û penaberîyê carina bi rîya karakteran têr nîşandan di deqên edebî de. Hêlim Yûsiv jî di romana xwe ya dûmahîkê 99 Morîkêñ Belavbûyî<sup>1</sup>de li ser sedemên penaberî û sirgûnîyê disekine û bi rîya gelek karakteran vê yekê nîşan dide. Em ê jî di vê lêkolîna xwe de li pey şopa hêmanên sirgûn û penaberîyê bikevin bê ka di vê romanê de ev hêman çawa hatine vegotin, têkilîyeke çawa di navbera sirgûn, penaberî, koçberî û diasporayêde heye, diasporaya kurd xwedîyê kîjan taybetmendîyan e, di nav romanên kurdî yên li sirgûnê de wek deqeke edebî wekhevî û cudahîyên romana H. Yûsiv ci ne, di vê romanê de rewşa penaberan û entegrasyona wan çawa hatîye vegotin...hwd.

## 2. Sirgûn û Penaberî

Li ser sirgûnê gelek tişt hatine gotin bê ka ew ci ye, ci nîne? Ev hemû jî di çarçoveya peyvîn ‘welat’, ‘desthilatî’, ‘cezakirin’, ‘derkirin’, ‘qedexe’, ‘sîyasî’, ‘jênerazîbûn’..hwd de têr pênasékirin. Em jî dê pêşiyê fîkrêñ

1 Yûsiv, Hêlim. 99 Morîkêñ Belavbûyî, Peywend, 2015, İstanbul.

lêkolîneran ên li ser sirgûn, penaberî, koçberî û dîasporayê bidin piştre derbasî romanê bibin.

Sirgûn gelemerî wek qedexekirinê tê pênasekirin. Dewlet ji bo ku pêşîya hewldanê kom û mirovên ku dixwazin rêveberîyê yan jî rejîmê biguherînin bigire, bi awayekî fizikî wan ji welatê wan dûr dixe.<sup>2</sup> (Allatson û McCormack 10) Di vê dûrxistinê de erka siyâsi, ji bo îstîkrara rêveberîya xwe van kesan talûkedar dibîne lewma wan sirgûn dike. Ji ber vê yekê divê mirov bibêje ku kesê sirgûn gelek caran rewşenbîrek, siyasetmedarek, nivîskarek yan jî hunermendek e. Li sirgûnîyê cihê têgeha ‘welat’ gelek caran ‘zimanê dayîkê’ digire. Welatê kesê sirgûn gelek li dûr e lê bi axaftin, nivîsandin, guhdarîkirin û xwendina zimanê xwe ve, yê sirgûn têkilîya xwe ya bi welatê xwe re nabire. Di xeyal û bîranînên wî de ew welat geş û ruhber e.

Wek di destpêkê de jî hate dîyarkirin wateya peyva ‘sirgûn’ê bi demê re guherîye, êdî ji ber gelek sedemên cuda mirov ji welatê xwe derdi Kevin yan jî mecbûr dimînin ku jê dûr bikevin. Gelo ji bilî sedemên takekesî peyva sirgûnê ji bo koçkirin yan jî penaberîya bi girseyî jî dikare bê emilandin? Hejmara mirovên ku ji ber zilma nijadî û dînî, ji pêkuî û pevçûnên netewî û navnetewî, ji neçarîyê ji welatê xwe revîyane her ku diçe zêdetir dibe. Ew êdî ji derveyî çarçoveya ‘sirgûn’ê, wek ‘penaber’, ‘mirovê ku ji cihê xwe hatî dûrxistin’, ‘mirovê ku mihtacê parastinê ye’ tê binavkirin. (Hanne 4)

Kesê ku li welitekî din bicih bûye, wek sirgûnekî dibe ku hissîyata bîyanîbûn û tenêtîyê bibe para wî jî lê ew bi qasî sirgûnekî rast li qedexeyên hişk nayê. (Said 144)

Sophia McClennen koçberîyê ji sirgûn, dîaspora û penaberîyê cuda dike. Li gor wê ‘koçber’ ew kes e ku bi daxwaza xwe koç dike lê têgehê din girêdayî cihguhertineke mecbûrî ne. (19)

Herçend ku di biryara koçberîyê de sedemên mecbûrî hebe jî ew bi dilê mirov dibe. Li hember vê yekê di rewşa sirgûnîyê de ew ne bi dilê mirov e, bi darê zorê ye lewma xetereya jidestçûyîna azadîyê heye. Di herduran jî ji bo welêt bêrikirinek heye lê tişta ku şertên kesê sirgûn zehmettir dike qedexeyên li ser jîyana wî ne. (P. Rose 7)

P. Rose gotinên Bertolt Brecht ên li ser sirgûn û penaberîya wî jî

2 Fikrîn M. Hanne, E.Said, S. McClennen, I. Rose yên di çarçoveya sirgûnê de, ji lêkolîna Demet Karabulutê hatine girtin. Wergera wan ji îngîlîzi bo tirkî ji cenabê Karabulut ve hatine kirin. (Karabulut, Demet. *Sürgünlük Edebiyatı Bağlamında R. Halid Karay'ın Yapıtları*, Teza Neçapbûyi, İstanbul Bilgi Üniversitesi. Stenbol, 2011.)

radighîne. Brecht dibêje ku 'Penaber, tê maneya mirovê ku ji welatê xwe derketîye. Lê em bi dilê xwe ji welatê xwe derneketin û ji bo ku em bijîn me cihekî din jî nebijart. Bi tenê em revîyan, her tişt li me hate qedexekirin û em hatin derkirin. Cihê ku wê me bipejirîne wê ew nebe mala me, ew ê bibe cihê sirgûnîya me.' (9)

Sirgûn ferdî ye lê penaberî gelemparî (kamusal) ye. Ger kesek xwe wek yekî "sirgûn" bide nasandin di wê helwesta wî de serhildanek heye; ku bêje 'Ez penaber im' êdî ew stûxwarî ye. (Turan 159)

Li gor Peymana Cenevreyê penaber ew kes e ku ji ber nijad, dîn, tabîiyet û mensûbiyeta xwe ya civalî û fikra xwe ya siyâsî zilmê dibîne lewma ji ji mafê parastina welatê xwe bêpar dibe û ji bêgavîyê ji welatê xwe direve. Bi Danezana Penaberan a Carteganayê (1984) re ev pênase hinekî din hate berfirehkîrin; li gor vê yekê ew kesê ku ji ber darê zorê, êrisen jiderveyî û pevcûnên navxweyî, ji ber rewşa binpêkirina mafêñ wî, ewlehî û azadîya wî dixe bin xetereyê; lewma ew neçar dimîne ji welatê xwe direve û dibe penaber. (Hazan 187-189)

Dîaspora wek sirgûnê ne bi tenê tê maneya ezmûnên koç û heramoyî-kirinê herwiha wateyêne wê yên nasnameya kollektîf û teşekulên civakî ji hene. Sirgûn zêdetir rewşike takekesî ye lê dîaspora xwedî wateyeke kollektîf e. Dîaspora ne bi tenê hesreta wenatekî ye, ew di heman demê de çalakîyeke kollektîf û tevgera avakirina wenatekî ye. (Alinia 119)

M. Alinia fîkrîn E. Said ên li ser sirgûnê radighîne. Li gor Said cu-dahîya sirgûnên berê û yên niha bi tundî û çewanîya wê ve dikare bê diyarkîrin. Ev heyam a penaberan, koçen girseyî û ya mirovênu ku bi darê zorê jîcîhêxwebûyî ye. Said mirovênu ne bi dilê xwe koç kirine û sirgûnan dişibîne hev. Ji bo vegera wan him derfeta wan nîne him jî wenatekî wan ku ew lê vegerin êdî tuneye. (80-81)

Berî ku em behsa romanê bikin ji bo ku em rewşa karakterên di romanê de yên ku li xerîbîyê dijîn baştır têbigîhin divê em li ser dîasporaya kurd jî bisekinin. Li hember şertên sirgûnî û heramoyîkirinê nasnameya kurdî li dîasporayê ji bo xwerizgarkîrin û liberxwedayînê wek palpiştekê hatîye seferberkîrin. Dîasporaya kurd, ji bo geşedana neteweperwerîya kurd, derketin û livdarîya sîyaseta kurd li derveyî welêt û ji bo avakirina mekanekî transnational (ulusasıri) xwedî rolêñ girîng e. Herwiha civaka kurd a li dîasporayê zêde polîtîzebûyî ye û xwedî rengekî homojen jî nîne. Tê de kesen ku ji ber sedemên aborî, ji bo xwendin û perwerdehîyê, ser-lêdanen statûya penaberîyê û herwiha kesen ku xwe li sirgûnîyê dibînin hene. (Alinia 324-330; Başer 175)

Niha jî em ê derbasî romanê bibin bê ka li gor pênaseyên li jor mirov rewşa karakterên di romanê de dikare çawa binirxîne.

### 3. Li ser 99 Morikêñ Belavbûyî...

Roman, bi kuştina Azadê ku di destê wî de morikêñ belavbûyî yên tizbîyekê hene, dest pê dike. Piştre em bi rîbaza *flashback* (bipaşdezi-virîn) vedigerin serî û guhdarîya çîroka Azadî dîkin. Azad di salêñ xwe yên dibistana seretayî de futbolê dilîze piştre dev ji futbolê berdide û berê xwe dide dinyaya xwendina pirtûkan, dikeve nav deryaya rengan, dest bi resimkirinê dike (Yûsiv 22). Wexta nû ji dayîk dibe dayîka wî dimire, ew bi jinbava xwe û zarokêñ wê re dijî. Ji keçeve bi navê Berîvanê hez dike lê Berîvan bi hevalê wî Yasîno re dizewice. Pişti çend salan Azad êdî diçe zanîngehê. Li zanîngehê her tişt di bin sîya rejîma Baasê de ye û kesen dijberê rejîmê têñ perçiqandin. Azad jî bi tawanbarîya sîyasî tê girtin, di girtîgehê de bi tehdeyîyêñ mezin rûmeta wî tê şikandin. Pişti ji girtîgehê derdikeve direve Elmanyayê.

Azad ji ber sedemêñ sîyasî welatê xwe diterikîne, li Elmanyayê ligel gelek zehmetîyan mafê penaberîyê digire. Li kursa Elmanî de hejî ma-mosteya xwe Sandrayê dike û ew dizewicin. Keçeve wan bi navê Dana çêdibe. Pişti demekê ji ber ku Sandra ji her tiştê Azadî dikeve şikê û hesûdîyê dike, ji hev vediqetin. Di vê navberê de Azad elmanî baştıñ hîn dibe û pişti 2 salan diçe dibistaneke zimêñ dibe wergêr û heta dûmahîka umrê xwe wergêriyê dike. Wexta ku rastî nexweşekî bi navê Hisenê tê jîyana wî diguhere. Hisenê pazdeh salî kurê Berîvanê ye û ji ber şer ji Amûdê revîye hatîye Elmanyayê. Pişti ku Azad vê hîn dibe hayîkarîya wî dike û Berîvanê tîne Elmanyayê. Mirov dibe qey Azad di dûmahîka umrê xwe de digihe miraza xwe lê ew ji alîyê ciwanekî ku nexweşîyêñ derûnî pêre hene, tê kuştin. Wexta ew tê kuştin ku li rex termê wî çend marêñ keskî deqdeqî jî hene. Remezan Alan bibîrxistina van maran wek alegorîyekê bi rejîma Baasê re rave dike. (189)

Rewşa sirgûn û penaberîyê herî zêde bi hebûn/tunebûna welitekî li dû mayî tê vegotin di romanê de. Her karekterekî di romanê de li xeribîyê bi bîranînêñ xwe li welatê xwe digere. Ji ber ku Azad di nexweşxaneyekê de wergêriyê dike em çîroka gelek penaberan hîn dîbin bê ji ber çi bûne penaber.

Yek ji penaberên ku Azad jê re wergêriyê dike Hemze ye. Ji ber ku sistema cerdewanîyê qebûl nekirîye dewletê agir berdaye gundê wî, mala wî xirab kirîye. Lewma pêşiyê ji Mêrdînê koç kirine Mersînê. Li Mersînê jî ji ber erişen tirkêñ ku ji kurdan nefret dîkin berê xwe dane Ewrûpayê

û hatine Elmanyayê. Li wir jî komeke xortên elman ji ber ku wî tirk di-hesibînin erişê dibil li ser restauranta wî. Nivîskar vê trajedîya Hemze bi bêdewletbûnê rave dike. Hemze ji doktorê re dibêje:

Li Tirkîyê, ji ber ku "kurdekî bi qirêj im", çend tirkan êrîşî min kirin û ez ji welatê xwe derxistim. Li Elmanyayê jî ji ber ku ez "tirkekî biqirêj im", dixwazin min ji welatê xwe derxînin. Ka vê tevlihevîyê ji nav hev derxîne Xanima delal! Eger derdê min ne bê dewletbûn be çi ye gelo? Eger dewleta me jî hebûya, wê kê karîbûya wilo min bêrûmet û şerpeze bikira? (93).

Ji bilî koça kurdan a di salêن 1960an de ji bo kar berê xwe dane Ewrupayê, koçen kurdan ne bi dilê wan bû. Ew ji ber sedemên sîyasî û şerênu ku li ser erdnîgarîya wan diqewimî bûne penaber. Lewma komên diasporîk ên kurdan di esasê xwe de ji penaberan, mirovîn nejidil û koçberên bi darê zorê jîcihêxwebûyî pêk tê. Ji ber vê yekê jî vegera ji bo welêt ne pêkan e. Bîranîn û serpêhatîyên wan jî bi gelempêrî trawmatîk in.

Di romanê de behsa mirovîn ku ji wextêن cuda ji Kurdistanê neçar dimînin ku berê xwe bidin ewrupayê tê kirin. Koçen kurdêن li Iraq û Sûriyeyê li gor romanê mirov dikare bi du deman girê bide. Wexta di salêن 1960î de desthilatdarîyên Baasê dest bi erebkirina Kurdistanê di-kin û di serê salêن 2000î heta niha jî jiber têkçûna van herdu rejîman kurd koç dikan Ewrupayê. Koçkirina kurdêن bakur jî di romanê de zêde-tir girêdayî salêن 90î yê ji ber şerê ku li Kurdistanê diqewimî, tê vegotin.

Wexta Azad ji Hemze re wergêrîyê dike dîsa xerîbîya wî tê bîra wî, dibêje ku "Li welêt ez ji xerîbîyê direvîyam û li xerîbîyê li wenatekî digerim." (95).

Bawer ji ber ku nikare bêyî hayîkarîya doktoran oksijenê bistîne û bêhnîçik dimîne malbata wî zarokêن xwe tînin Elmanyayê. Ji ber ku rewşa wî nebaş e Azad xemgîn dibe û digirî lê dibêje "Min nizanîbû ne li ser Bawerê biçûk ê li benda mirinê ye digirîm, ne jî li ser xwe ez **zarokê ku li wenatekî bê oksijen hatibû dinyayê** digirîm<sup>3</sup>..." (103).

Wexta ku cara ewil Azad tê Elmanyayê ji wî we ye ku her kesekî lê dinê-re dipirse ka gelo "ev mîrikê bîyanî yê mîna müştekî, li vir çi dike?" (46).

Li gor Azad, penaberek wexta ku şûn û şopa welatê xwe yê jidayik-bûnê winda dike dibe wek kûsîyekê. Fîkrêن Azad ên li jêr herçend ku li ser penaberîyê ne jî mirov dikare heman tiştan ji bo kesekî sirgün jî bibêje:

3 Di jîgirtinan de reşkirina pevv û hevokan ji aliyê me ve hatiye kirin (I.C.S.).

Penaberî tiştekî wisa ye ku tu di kolanên tije xelk re bimeşî, pêrgî hezaran kesan bibî, bêyî ku yek bîranîn di nav te û kesekî ji wan de hebe... Ev tê wê wateyê ku pêkenokeke hevbeş tune ye mirov bi hev re pê bikene, wisa jî bûyerek tune ye ku hûn bi hev re xemgîn kiribin... (47).

Cihana sirgûnî bi rev û tenêtîyê hatîye veçinandin. Cihê ku sirgûn jê veqetîyayî di heman demê de ew cih e ku wî girê dide li wê derê. Bîranîn kesê sirgûn û tiştên ku wî jîyane û şopên wê rastîya hebûna sirgûnî ye. Ger sirgûn rêuwitîyek be cihê ku mirov digihê hercar paşeroja mirov bixwe ye. Kesê sirgûn li wê paşerojê dijî û li pirsa wê dike. Ew ji bo ku hînî sirgûnîyê nebe û cihê ku lê dijî qebûl neke, nasnava xwe berze neke li ber xwe dide. Ew bi hêma û xeyalan dixwaze xwe bigihîne welatê xwe. (Andaç 12)

Em dibînin ku Azad jî wek kesekî li sirgûnîyê ye. Ji ciwanîya xwe heta dibe 50 sañ ew li Elmanyayê dijî hêj jî behsa zaroktîya xwe dike. Herwiha siya dîya wî wek balinneyekê her car li dû wî ye. Ev di navbera bîranînên duh û iro de pirekê ava bike jî gelek caran naxwaze ji dema duh veqete:

Ez bibûm dîlê sal û rojêner basbûyî. Ez di duh de dijîyam. Mîna gurekî pîr û diranketî di şikefta bîranînên xwe yên pûç û vala de dijîyam. Dema duh zora min dibir, min nedixwest dest jê bedrim, lê dema ji nav herrîya wan bîranînên tîr derdiketim, min nedixwest ku careke din vegirim nav wê bêdengîya tîr û xemgîn(76).

Azad dema ku li kampa penaberan li hêvîya mafê rûniştinê disekine kurdekî bi navê Muxtar nas dike. Muxtar, elmanênu ku li dû şopa nazîyan ketine û êrîşî penaberan dikin mafdar dibîne. Li gor wî "yê ku bi kêrî welatê xwe neyê, wê tu xêra wî ji welatê xelkê re jî tune be." (114). Lewma "welatê mirov herdu baskê mirov in" (115).

Dema ku keça wî Dana çêdibe herçend ku Azad dibêje ew "ji nû ve ji dayîk bûye" dîsa jî nikare penaberîya xwe ji bîr bike:

...Ne tenê Dana ez jî weku bavekî nû jidayîk bibûm. Lê ne dê û ne bav, ne kes û ne kûs, ne dost û ne jî heval. **Wisa bi tenê, bîyanî, baskşîkestî û qiriktal li welatekî bîyanî, kerr û lal.** Min wê rojê hêşirênen welatekî bi ser Dana de barandin. Dana teyrika biçûçik, **çêlikâ civîkekî bê hêlin û bê mal.** Bi van hestên tevlihev re geh bi xwe dihisîyam ku min súcdarîyek jî kirîye. Ji ber ku wê di siberojê de ev zarok **jî derdê bavê xwe yê bîyanî û dilbikul bikişîne...**(85).

Azad di dûmähîka romanê de dibêje roja ku ew ji welatê xwe derketîye hînbûye ku derketina mirov ji welatê wî tê maneya windakirina rûmeta wî, welatê wî yê nû ji bilî rûmeta wî her tişt dayê (147).

Em dibînin ku di romanê de karakterên li xerîbîyê her car li ser têgaha welêt disekeinin bê ka ji bo wan ew tê çi wateyê. Ango ew “wateyên ‘welat’ durist dîkin û mirov dikare bi rehetî bibîne ku di pêvajoya vê duristkirinê de xemxwerî û şînîya bo windakirina wê zal û berçav e.” (Galip 2014:157)

Hemo, deh sal e li Elmanyayê dijî lê hêj jî hînî elmanî nebûye. Wek penaberekî Hemo, ne bi dilê xwe ji welatê xwe veqetîyaye. Ne nan, ne ava vî welatî li wî hatîye. Ew xwe û welatê xwe dişibîne masî û avê. Çawa ku masî ji avê derdikeve dimire, ew jî wexta ji welatê xwe derketîye heta niha hêdî hêdî dimire (107).

Kesê sirgûn nikare bikeve ser kûrm û kirâsê derdora ku lêhatîye sirgûnkirin. Ku ev yek bibe jî êdî navê wê nabe sirgûn (Timuçin 36).

Em dikarin vê yekê bînin li ser rewşa Hudayê. Huda ji ber karêni sîyasî di nav xwendekarêni zanîneha Helebêde tê girtin. Piştî ku tê berdan direve Elmanyayê. Li gor wê ger rojek jî ji umrê wê bimîne ew dixwaze vegere welatê xwe lewma hînî elmanî nebûye (127).

Di van herdu mînakên li jor em dibînin ku nehînbûna elmanî ji alî-yekekê ve mirov dikare bi encama neyêni ya entegrasyonê şîrove bike ku bi deh salan penaberek nekarîye zimanê welatê ku dijî hîn bibe. Ji alîyê din ve jî ev rewş bi helwesta sirgûnîyekî/ê jî dikare bê şîrovekirin ku ew hînî rewşa sirgûnîyê bibin ew ê bê maneya îxanetê.

Ji ber ku li rojhilata navîn û li çar perçeyê Kurdistanê şer heye, kurd û netewên din neçar dimînin, koç dîkin Ewrûpayê di romanê de. Carina ji ber sedema dermankirina nexweşîyan ew koç dîkin. Lewma sedemên koçkirinê yêk wek; sîyasî, aborî û tenduristîyê hene. Lê ev koçkirin herçend ku ji ber sedemên cuda jî be karakterên di romanê de him wek kesen sirgûn him jî wek penaberan dikarin bêñ nirxandin. Herçend ku ew penaber in û êdî nikarin vejerin welatê xwe, li xerîbîyê rewşa wan ji ya sirgûnekî baştir nîne.

Amin Maalouf li ser nasnameya koçberîyê ya dualî dibêje ku ‘Kesê koçber di nav du civakên ji hev cuda de dijî û di nav herdu civatan de xwedîyê heman statûyê nîne. Wek mînak, di bajarê ku hatîye sirgûnkirin de kesek bi stûxwarî, karekî zehmet dike, li welatê xwe dijberî rewşa penaberîyê dibe yekî jixwebawer û rêzdar ku herkes hurmetê nîşanî wî dide. (Neqilkirin Cengiz 189)

Ehmedê Kerkükî jî yek ji wan kesan e. Ew li welatê xwe ronakbîrekî liserkew, endazyarê avahîyan e. Her kes li benda guhdarîkirina nêrînên wî dimîne, lê li xerîbîyê ew ne tu tişt e. (98)

Azad him li Amûdê him jî li Elmanyayê dixwaze bibe avakarê piran. Ew dixwaze ku 'bi avakirina pirên hilweşîyayî yên di nav mirovan de ku bi hev re dijîn û ji hev tênaqîhêjin' hinekî birîna xwe derman bike (91) lê dîsa jî ew ji 'bîyanîyê ku di hundirê wî de ye' fahm nake. ( 21)

H. Yûsiv di destpêka romanê de behsa nivîsandina çîroka vê romanê dike dibêje ku piştî demekê ji bo ku ew debara xwe bike dest bi wergêriyê dike. Du salan piştî hatina wî ya li Elmanyayê li herêma Nedersaksenê rastî kuştina kurdekî porspî tê. Wexta H. Yûsiv di nexweşxaneyekê de dibe wergêrê jineke kurd jê hîn dibe ku ew mîrik ji alîyê ciwanekî elman ve hatîye kuştin. Jin, deftera ku ji rojnívîskên wî kurdê porspî pêk tê dide H.Yûsiv. ( 5) Li gor vê têbinîya H. Yûsiv em hîn dibîn ku fikra vê romanê ji vê bûyera rasteqîn derketîye. Özlem Galip di xebata xwe ya li ser romanêni kurdî yên dîasporayê de destnîşan dike ku romannûsên kurdên li dîasporayê gelek caran di destpêkên romanêni xwe de dîyar di-kin ku ew bûyerên ku di romanê de têni behskirin ji bûyer û serpêhatîyên wan a jîyana rasteqîn pêk hatîye. Sedem jî ew e ku bi vê yekê nivîskar him dixwaze xwîner bawerîya xwe bi gotinê wî bîne him jî ev yek ji bo qeydkirina serpêhatîyan û dîroka kollektif erkekî xwe heye. (Galip 87)

#### 4. Rewşa Penaberan li Elmanyayê û Entegrasyona Wan

Berîya ku em derbasî mijarê bibin divêt em li ser politîkayêne dewleta Elmanyayê yên derbareyî rewşa penaberan de bisekinin. Li gor Qanûna Hemwelatîyê (2000) ji bo ku kesek bikare bibe hemwelatîyê Elmanyayê divê 8 salan li wir bijî, xwedîyê destûra rûniştinê ya domdar be, bikare bêyi alîkarîyê civakî jîyana xwe bidomîne, nirxên makezagona dewletê bipejirîne, ji azmûnên bo pejirandina hemwelatîyê derbas bibe û qeydiya wî ya sebiqayê jî tune be. Penaber li Elmanyayê nemaze di istihdam û perwerdehîyê de pêrgî heramoyîkirin û dijminahîyê têni. Wek politîkayekê, pirçandî (multiculturalism) di esasê xwe de li Elmanyayê tune ye. Li gor dîskura *Leitkultur* (Çanda Pêşdar) di nav çanda elmanan de pişafit bivê-nevê ye herwiha divê koç bê kontrolkirin û kêmkirin. (Başer 126-135)

Entegrasyon di nav civakekê de yekparebûna (bütünleşme) komên cuda yên çandî, nijadî, nasnameyî ye. Li vir tişta girîng her komek qewmî bi nasname û çanda xwe ve tev li vê yekparebûnê dibe, ne ku wan bide rexekê. Di pêvajoya entegrasyon û yekparebûnê de takekes li nirxên sereke yên civakî û çandî yên civaka nû xwedî derdikeve. (Yavuz 38)

Li gor vê yekê ger em bêni ser kurdên li Elmanyayê bê ka ew li Elman-

yayê di kîjan rewşê de ne, divê em bi bîr bînin ku kurd li Elmanyayê ji bilî heramoyîkirin û dijminahîya bîyanîyan (xenophobia) ji bo ku xwe wek kurd bidin pejirandin ketin nav hewldanan; lê rastî gelek zihmetîyan hatin û ev daxwaza wan nehat pejirandin. Herçend kû li Elmanyayê piştî tirkan, 2'yemîn neteweya qelebalix kurd bin jî ji ber ku ew xwedîyê nasnameyeke neteweyî nînin ji mafêñ penaberan ên ku ji neteweyê din re hatine dayîn (perwerde û xizmetêñ bi zimanê dayîkê...hwd) bê par dimînin. (Başer 178)

Gelo di romanê de rewşa kurdêñ penaber, têkilîya wan a bi dewlet û civaka elman re çawa hatîye vegotin? Ji bilî êrişên ciwanêñ elman li hemberî penaberan, rexne li polîtfikayêñ entegrasyonê ya dewleta Elmanyayê tên kirin di vê romanê de û behsa astengêñ bûrokrasîyê, bidestxistina mafêñ rûniştinê, li kampêñ penaberan jî tê kirin lê ev jî bi çend hevokan sînorkirî ye.

Em pêrgî penaberîya wî tên di zewaca Azadê penaber û Sandraya elman de. Azad ‘xerîbê qiriktal û bîyanîyê baskşikestî’, ‘bîyanîyê ku ji dawîya dinyayê hatîye’, ‘têkçûyi’ (60-61), ‘melûl û xemgîn’ (67), ‘feqîrê Xwedê, penaberê dilşikestî, gurê pîr ê ku di şikefta tenêtî û xerîbîyê de digevize’ (72)

Bi zewaca du kesêñ ji çandêñ cuda divîyabû xwendevan rastî zêdetir danberhevkiranın hatibûya lê di vê romanê de em vê yekê nabînin zêde.

Sandra, Azad vedixwîne mala xwe jê re xwarineke kurdan amade dike ku tê de goştê mirîşkan, girar, şorbenîsk, tîrşika bacanêñ sor, selete û dew heye. Piştî xwarinê jî çayekî tîne. Em ji Azad hîn dîbin ku Sandrayê ev xwarin hemû di dema kursê de ji xwendekarêñ xwe yên kurd hîn bûye. Li hemberî vê xizmeta Sandrayê Azadê resam portreya ku bo wê çêkirîye dîyarîyê wê dike. Li gor Azad; Sandra ‘jineke bi tenê û liserkwe’ be ew bixwe jî ‘mîrekî penaber û şikestî’ ye. (79) Penaberîya wî bi tenê dema ku ew û Sandra bi hev şâ dîbin ji bîra wî diçe. (80) Ji ber ku Sandra hesudîya Azad dike êdî Azad pê re idare nake û ew vediqetin.

Li gor Azadî entegrasyon herçend ku tê wateya jîyana bi hev re ew wate dîsa jî kulek dimîne. Mebest ji entegrasyonê ew e ku ‘ev xelkên nû dest ji civaka xwe berdidin û tên welatêñ Ewrûpayê, divê di nav vê civaka nû de integre bibin, ango karîbin tev lê bibin û di nav de cihê xwe bigirin.’ (90).

Rewşa penaberêñ ku neçar dîbin ji cih û warêñ xwe derkevin tên Ewrûpayê Azad bi rîya xewnekê rave dike. Di xewna xwe de Azad dibîne ku welatê ku wî koç lê kirîye- wek welatê duyem bi nav dike- cihêñ mezîn

ên avjenîyê vekirine, bi dehan karmend û polîs li wir wezîfedar kirine. Ew her kesekî nû tê welatê wan bêyî ku bipirsin ew avjenîyê dizanin an na, wan diavêjin nav avê. Wexta Azad vê yekê dipirse jê re dibêjin ku ‘ew ê hînî vê jîyana nû bibin lewma bo vê yekê ew qanûnan pêk tînin’. Azad wiha dibêje di dûmahîkê de:

(...) Li hêlekê dewleta welatê duyem ew wilo bêserûber davêtin nav avê û li hêla din bi dehan dezgehêن alîkarîyê ava kiribûn û pere didan xebatkarêن van dezgehan. Min di dilê xwe digot;ne wilo wan biavêjin nav avê û ne jî ewqas pere li alîkarîya wan xerc bikin... (r. 142).

Hemo, deh sal e li Elmanyayê dijî lê qet elmanî hîn nebûye. Hemo dema ji zarokêن xwe re behsa şîretêن bavê xwe dike dibêje ku bavê wî jê re gotîye “Welatê xelkê nabe welatê mirov lawo. Bi qedrê welatê xwe zanibin.’ Gava ew van gotinêن bavê xwe ji zarokêن xwe re radighîne zarok dibêjin ‘Welatekî me hebe ev der e. Em li vir mezin bûne û hînî jîyana vir bûne.’ (109).

Li vir xwezi nivîskarhinekî behsa entegrasyona zarokêن bîyanî kiribûya bê ew çawa entegreyî sîstema perwerdehîya Elmanyayê bûne û çawa hînî jîyana wir bûne ku “ew der” êdî bûye welatê wan.

Behramê ku ji ber şer herdu çavên wî kor bûne ji Azad re dibêje ‘ez hêdî hêdî hînî korbûnê jî dibim, lê ez dikim û nakim hînî jîyana vê Ewrûpayê nabim.’ (122).

Jî ber muameleyên bûrokrasiyê rexne li direjbûna çareserkirina pîrgirikêن penaberan tê kirin di romanê de. Herdu çavên Behram kor in lewma dema tixtor dixwaze darekî wek gopalî bide wî dest bi dîroka darê koran dike bê gelo ew di sedsala hijdehan de çawa bûye... hwd. Herwiha ji bo muameleyêن din jî Behram muameleyêن bûrokrasiya Elmanyayê wiha rexne dike:

Ev elman jî ewqasî xulqê wan heye li ser tiştekî biçûcîk bi dehêن kitêban çêbikin, yanê heta vê malê bi kirê bidin te, wê behsa sêsed û pêncî û şes qanûn manûnan bikin û berî kirê piştî kirê divê çawa bibe. Yanî her ku behsa tiştekî dîkin mirov dibê qey ev sêsed sal in ku tenê serê xwe bi vê meselê re êşandine. Welleh heta li vir karekî digihînim serî kezeba min res dibe... (123).

Carina behsa pêvçûnêن penaberan ên bi hevdu re jî tê kirin di romanê de. Dema ku Azad ji bo hînbûna elmanî diçe kursê li wir rastî nîqaşêke di navbera çend tîrkan û kurdekî tê. Dema hevnaşînê Mehmet ji ber ku gotîye ew ji Kurdistanê ye yên tîrk li dijî vê rabûne û qebûl nekirine ku Dîyarbekir Kurdistan e. Mamosteya elman Sandra dibêje ku berîya niha

jî pêvçûnên bi vî rengî di navbera Filîstînî û İsraîlîyan, Baskî û İspanîyan de jî çêbûne lê kî ci navî li welatê xwe dike ev mafekî xwezayî ye lê hişyarîyekê dike ku ‘divê ew ji bîr nekin ev der Elmanya ye, ne welateke din an jî deverike din e.’(59).

Ji mijara penaberan a entegrasyonê zêdetir karakter bi raborîya xwe, welatê lidû mayî yê bi êş û jan û nexweşîyênu ku ji wî welatî hatine Elmanyayê û daxwaza vegera axa xwe cih digirin di romanê de.

## 5. Encam

Bi awayekî realîst behsa sedemên koçkirina Kurdan a ber bi Elmanyayê ve tê kirin di romana 99 *Morîkên Belaubûyîde*. Bi rêya van karakteran em ji rewşa penaberên ku li Elmanyayê dijîn haydar dîbin. Em hîn dîbin ku li xerîbîyê kesê sirgûn, ê koçber û yê penaber her bîyanî ne. Herçend ku ew li ser axeke xerîb dijîn jî welatê wan her tim di bîra wan de ye û hemû karakterên li xerîbîyê li welatê xwe digerin lê dîsa jî nikarin lê vegeerin. Ji ber vê yekê ew hinek jî dişibin sirgûnan. Lêgerîn û duristkirina ‘welêt’ a karakterên di vê romanê de wê dişibîne romanen din ên kurdî. Di xebatêni li ser edebiyata kurdî ya li dîasporayê de lêkolîner zêdetir li ser Swêdê dissekinin. Lewma perçeyên din ên dîasporaya kurd di vê çarçoveyê de têni îhmalkirin. Herçend ku romanek têrê neke jî me jî xwest bi vê nivîsa xwe bala lêkolîneran bibin li ser Elmanyayê. Di vê xebata xwe de me dît ku wateya peyva sirgûnê êdî ne yek e, pir e. Ev jî nîşan dide ku êdî rewsek û rengeke sirgûnîyê bitenê nîne û hemû rewşen girêdayî koçkirinê bi tenê bi peyva sirgûnê nikarin bêr ravekirin. Lewma dema xebat li ser sirgûnîyê têni kirin divê haya me ji wateya têgehêن penaberî, koçberî û dîasporayê jî hebe.

## ÇAVKANÎ

Alan, Remezan. *Destpêkek ji bo Zanista Edebîyata Modern*, Stenbol: Peywend, 2015.

Allatson Paul û Jo McCormack, ed. *Exile Cultures, Misplaced Identities*. New York: Editions Rodopi, 2008.

Alinia, Mino. *Dîaspora Mekânları Öteki Olma Deneyimleri ve Aidiyet Politikalari*, Stenbol: Avesta, 2007.

Andaç Feridun. “Sürgün Sözlerin Anlamı” *Sürgün Edebîyati, Edebîyat Sürgünleri*, Amadekar: Feridun Andaç, Stenbol: Bağlam, 1996.

\_\_\_\_\_ & Aytaç Gürsel. “Sürgün Edebîyati Açık Oturum”

- Başer, Bahar. *Diaspora'da Türk-Kürt Sorunu (Almanya ve İsviç'te İlkinci Kuşak Göçmenler)*, Stenbol: İletişim, 2013.
- Cengiz, Semran. "Göç, Kimlik ve Edebiyat" *Zeitschrift für die Welt der Türken Journal of World of Turks*, ZfWT Cild. 2, Hej.3 (2010)
- Galip, Ozlem Belcim, *Imagining Kurdistan: Identity, Culture and Society*, I. B. Tauris, 2015.
- \_\_\_\_\_ "Xeyal û Têgihiştina 'Kurdistanê' di Romanên Kurdî de:Hesta Berdewam a 'Bîyanîbûn'ê", *Tîr û Armanc (gotarêñ rexneyî li ser edebîyata kurdî ya modern)*, Amadekar: Remezan Alan-Ergin Öpenguin, Stenbol: Peywend, 2014.
- Hanne, Michael, ed. "Creativity and Exile: An Introduction". *Creativity in Exile*. New York: Editions Rodop, 2004.
- Hazan, Jacop Ceki. "Geçmişten Geleceğe Zorunlu Göç: Mülteciler ve Ülke İçinde Yerinden Edilmiş Kişiler" *Küreselleşme Çağında Göç Kavramlar, Tartışmalar*. Amadekar: S. Gürler Ihlamur Öner-N. Ash Şirin Öner, Stenbol:İletişim, 2015.
- Karabulut, Demet. *Tez Adı:Sürgünük Edebiyatı Bağlamında R. Halid Karay'in Yapıtları, İstanbul Bilgi Üniversitesi*. Stenbol, 2011.
- McClenen, Sophia. *The Dialectics of Exile: Nation, Time, Language, and Space*. Indiana: Purdue University Press, 2004.
- Rose, Peter Isaac. *The Dispossessed: The Anatomy of Exile*. Minneapolis: University of Minnesota Press, 1999.
- Said, Edward, ed. *Reflections on Exile and Other Essays*. Massachusetts: Harvard University Press, 2002.
- Turan, Güven. "Sürgünün Sınırı Var mı?" *kitap-lık*, hejmar: 34, 1998.
- Yavuz, Sefer. "Göç, Entegrasyon ve Din: Avrupa'da Yaşayan Türkler Bağlamında Bir Değerlendirme" *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi* Cild. 6, Hej. 26 (2013)
- Yûsiv, Helîm. *99 Morîkêñ Belaubûyi*. Stenbol: Peywend, 2015.